

BI BONEYA
«ROJA ZIMANÊ DAYIKÊ YA CÎHANÎ»
HEMRENGIYA ZIMANAN
NÎŞANA ŞARISTANIYA CIVAKÊ YE

GUNDÊ TENÛRIYÊ



PEYVA WELAT



Kovara **WELAT**
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî

Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Bi Boneya "Roja Zimanê Dayikê Ya Cîhanî"

Hemrengiya Zimanan Nîşana Şaristaniya Cîvakê ye

Desteya sernivîs

2 Her sal, di 21ê reşemiyê de gelên cîhanê roja zimanê dayikê li dar dixin û şahiyê pê dikin. Hizira şabûna bi vê rojê vedigere sala 1999an, dema ku dewleta Bengladêşê destpêşxeriyek pêşkêşî rêxistina Yoniskoyê kir û tê de xwest ku 21ê reşemiyê bibe roja zimanê dayikê, ew jî ji ber ku ev roj helkeftî roja tekoşîna gelê Bengladîşê ji bo danasîna bi zimanê bengalî ye. bi vî awayî rêxistina Yoniskoyê ya cîhanî ev destpêşxerî pejirand û ji sala 2000an ve şabûn bi roja zimanê dayikê tê kirin.

Di daxuyaniya xwe ya îsal de, Yonisko dibêje ku hemrengiya zimanî li cîhanê rastî gefa jinavbirina gelek ziman tê, 40% ji şênîyên cîhanê mafê fînbûna bi zimanê dayikê bidest naxin, lê pêşketineke berçav di warê hînbûna bi zimanê dayikê heye. Her wiha rêxistina Yonisko tekez dike ku ziman bingeha civakên pirziman û pirçand çêdike.

Gelê kurd bi çavê pîroziyê li vê rojê dinere, çimkî zimanê kurdî heya roja me ya îro jî tûşî gelek kêşe û astengiyan dibe û hîn jî li jêr gefa jinavbirinê li ber xwe dide.

Wek ku tê zanînê, bi dehaê salan zimanê kurdî li her çar beşên Kurdistanê hatibû qedexekirin û hikûmetên desthilatdar li Sûriyê, Turkiyê, Îran û Iraqê bi rengekî bîrdozî û şofînist şerê zimanê kurdî dikir, mebesta wan ew bû ku gelê kurd di nav çanda gelên desthilatdar de bisojînin û bidin bişaftinê.

Tevî ku hemû hewldanên dijminên gelê kurd ji bo jinavbirina zimanê kurdî vala derketin, lê di

heman demê de jî wan dikarîbû ziyanekê mezin bigihînin zimanê kurdî.


Îro roj zimanê kurdî cihê xwe di nav zimanên cîhanî de digire, û di qonaxa geşbûnê re derbas dibe, lê hê jî gefên li ser wî ji holê ranebûne. Divê dewletên ku Kurdistan li wan hatiye dabeşkirin pênasiyê bi zimanê kurdî bikin û mafê hînbûna pê pesend bikin, û ev yek ji mafên mirov yên bingeşîn û sereke ye li gorî listeya mafên mirovan ya UNê û hemû rêxistinên navdewletî yên têkildar.

Her wiha ji her kurdekê-î tê xwestin ku xwedî li zimanê xwe yê dayikê derkeve, pê bixwîne û binivîse û biaxive. Wî biparêze û li pêş bixe.

Di dema ku em tê de roja zimanê dayikê li gelê xwe û li hemû gelên cîhanê pîroz dikin, em dibêjin ku hemrengiya zimanan li welatan nîşana dewlemedî û bedewiya wan civakan e, û divê rêz ji vê hemrengiyê re bête girtin da ku ew civak bi rengekî aştiyane û hevgirtî bijîn. ■

تَبَنِّي ثَوْرَة
adopt a revolution

(SERPÊHATIYA RÊWITIYEKÊ) “XWEZÎ BI KURDÎ ŞOR BIKIRA”



Berhîm Paşa

Ez li gara otobûsan ya Stenbul'ê, ji bo çûyina Welêt, li otobûsê siwar bûm. Li koltuxa rex a min, ciwanekî bîst û du-sê salî rûniştibû. Ji porê wî, yê ku bi makîneyê hatibû kurkirin xuya bû ku leşker e. Min silav lê kir û ez li cihê xwe rûniştim. Wî ciwanî jî bi ser hejandinê, silava min wergirt.

Ajotkarê otobûsê, otobûs bi ger xist û hêdî hêdî da ser riya ku em ê pê de herin. Bi desthejandinê, careke din min ji hevalan xatir xwest. Otobûsa me, mîna ku xwe bedre nav behreke pêl-pêlinî, wilo ket nav trafîka Stenbolê ya ku wekî morîstanan dimeşiya.

Va destpêka rêwîtiyek dirêj, ku hejdeh-bîst seetan dikşîneba. Hîn di vê setê de, xemgîniyekê ragirtibû dilê min. Ew xeyalên ku çûyina Welêt, dilê min har dikir û mîna çûkên serî ji wan dîkin dilê min wisa vedipirtikî. Lêbelê, vêga ji bo çi xemgînî? Vê hewa gebsoyî, ji bo çi ragirtibû dunya min? Min da veqetîna zar û zêcan? Min da veqetîna heval û dostên nû? Na divê ez dilşa bibûma, çunkî di dawîya vê rêwîtiya bi zehmet û dirêj de, dê û bavê min û gihêştina heval, hogir û yarên kevn hebû. Di ser de jî gihêştina welêt hebû!

Axx.... Welat. Ew welat nîn e ku, sedema helbestvaniya min û her tim mijara helbestên min e. Ew welat nîn e ku, her di dilê min de ye, geh dibe qêrîn, geh dibe lorîn, geh dibe kilam û geh dibe helbest. Ez bi welêt ve dikevim xewê, welat di xewê de xewn û pê hişyar dibim.

Welet, xurînî, taştê, firavîn û şîva min e. Ma gelo ev hewayê gebsoyî ji bo çi? Tu dibê ka bîhna bîso, bîhna barûtê, bîhna xwînê ragirtibû bîvila min. Dilê min li hev diket, çavên min li şevreş diçûn. Dunya li serê min teng dibû. Ez ketibûm nav behra xof û tirsê, lê belê ez ê çawa derketama, min nezanîbû. Ku tu li zeviyeka xwe, gêris diçînî, hirç û beraz dikevin navê û

garisê te talan dîkin! Wê çaxê tu hirs dibî, lê belê tu tişt jî ji destê te nayê, keda te, zar û ziçên te, di bin lingên hirç, berazan û hovan de diherimin. An jî deriyê hewşa mala te vekirî dimîne, bi şev rovî dikevê û mirîşk û ordekên te giştan qîr dîkin. Aha welat, aha zevî û hewşa derî vekirî maye.

Ev çi rewşek kambax e Xwedêyo! Ev çawa kar e ku îro kuçikên me jî, bi hirç, beraz û roviyan ve bûne hevpar.

Îroj welat wêran e.

Îroj welat talan bûye.

Îroj welat dişewite.

Îroj însanê min tê şkestin.

Tenê yên ku nikarîbûne bişkînin, hêviyên min ên li ser ayende ne. Ez bi dengê hevalê rex xwe, di nav wan xof û xeyalên kûr û dilxwer de, hişyar bûm.

Hevêl pirsî, ka ez ji ku derê me û rêwîtiya min ber bi ku derê ve ye. Lê belê ez wekî ku di xewek giran de û her termê şevê re têkoşîneke dijwar bidim, wisa xwîdanek reş, ragirtibû beden amin. Bi rastî jî, ez hîn nehatibûm ser hemdê xwe. Girêkek ketibû gewriya min. Bi kuxikê, min gewriya xwe paqîj kir û gotiyê: “Ez ji Gextê me û diçim Gextê*” Hevêl dilgeşiya xwe nîşan da got: “Ez jî Gextî me. Min leşkeriya xwe nû qedand. Ji ber ku min, destûra salane bi kar neanîbû, min gelekî bêriya welêt kiriye, hele dê û bavên min, ji pêş çavên min difûrin. Hejdeh meh çawa borîn, min fam nekir, lê belê ev hejdeh seet naqedin “Gotinên wî wekî têkevin guhekî min û di yê din re derkevin, xema min nîn bû. Lê belê ya ku bala min dikişand, min her çiqas bersîv bi kurdî didanê jî, ew bi înat bi tirkî diaxifin. Min yek tan jî lê didan lê zilam aciz nedibû. Wekî tiştêkî gelekî normal.

Kurmanciya herima me jî baş fam dikir. Lê belê bi kurdî nedixafî. Min da hewa leşkeriyê. Çunkî min dîtibû û gelek jî bihîstibû, gelek însanên me, ew ên bêfam, piştî leşkeriyê, li eslê xwe û li kurdîyê xwedî dernakevin. Rewşa wan bêxîretan wekî pêkenokan li ser zimanê gel bû.

Mînak; Ciwanekî nû leşkerî qedandiye vedigere mala xwe. Dê û bav û gundiyan wî dîkin nakin, ew xwe ji kurdî lal dike. Lê belê bi tirkî baş nizane. Pêzanîn li aliyekî, bes du-sê bêjeyên tirkî jiber kirine. Rojekê diya wî ji bo çêrê sêxil berdide. Wî ciwanî jî xwe daye beroj û wisa

dibêje: “ Kidê gel” Piştî karîkekê, hemêz dike, destê xwe dide qîloçê karîkê, ku hîn nû dane der, weha dibêje: “ Ana bu singleri kim seri bu da çaxmêş yapmêş? (Dayê kê di serê vê karîkê de ev singana kutane“(?

Ev mînekana gelek in lê belê ne mijara me ye. Min got dibe ku ew zîlam jî wîlo be. Ji ber vê yekê ez li ser nesekinîm. Çi çare lê ciwên dev ji min bernedida. Acizbûna min fam nedikir û bi kêfxweşiya dilê xwe pîrs li min dikir û diaxîfîn. Diaxîfî lê belê her bi tirkî. Min jî înat kiribû, ez qet bi tirkî neaxîfîm. Bi xêra Xwedê re, ciwan bi xew ve çû û min jî firseta pirtûk xwendinê bi dest xist.

Ajotkarê me vêsaneke (mola) din dabû. Ev vêsana çendan bû, nîzanim lê min hevalê xwe hişyar kir û em ji otobûsê dagêşîyan. Dunya sar bû. Baran hûrik hûrik dibarî. Zûtîrkê min dest û rûyê xwe şuştin û li aşxanê min bi hevalê xwe yê rêwitiyê re xurîniya xwe kir. Peyre jî me cixarek vexwer. Em dîsa li otobûsê siwar bûn. Êdî riya me hindik mabû. Bi qasî du-sê seetên din em ê bigihîştana cihê xwe. Heval bi îrsar, ez dawetî mala xwe dikirim. Min dikir nedikir çare nedidît. Digot: “Keko, gundê me li ser rêya gundê we ye. Kerem bike, îşev bibe mêvanê min. Hem tu yê vehêşî û bi serîkî zindî biçî gundê xwe û hem jî dê û bavên mim dê bi hatina te gelekî dilgeş bin. Haya dê û bavê min heye ku ez ê îro bêm. A niha birayê min li Gextê li hêviya min sekiniye.” Bêçare min got, baş e. Heval dilgeş bû, spasîyên xwe pêşkêş kirin.

Piştî nîvro em gihêştin Gextê. Em li garê ji otobûsê peya bûn. Bi rastî birayê hevalê min li benda wî sekinîbû. Min carek din hebekî xwe giran kir lê belê tu fêde nîn bû. Birayê havalê min jî îrsar kir hem jî bi kurdiyê zelal û gelêrî. Ez Ecêbmayî mam. Ez zêde dirêj nekim. Em li taksiyê siwar bûn û me da ser riya gund. Bi qasî deh-panzdeh deqîqeyan em gihîştin gund.

Dê, bav û gundiyên hevalê min li ser rê kom bûbûn. Em çaxa ji taksiyê peya bûn, li ber lingên hevalê min, beraneke serjê kirin. Di nav wê komê de jinepîrekê her du destên xwe ber bi jor ve kirin û wisa dia kir: “ Ya Reb! Min hatina neviyê xwe ji ekseriyê dît, carekê jî min bidîta ku neviyê min, bi kurdî şor bikira, min ê qurbanek din jî serjê bikira û li feqîr-fuqaran belav bikira”.

Ez bi diayên jinepîrê carek din ecêbmayî mam. Tiştê ku ez li ser sekinîbûm, vê carê jî imin re bû meraqeke giran. Em gişt bi hev re hilkişîyan mala wan.

Piştî nimêja îşayê civata gundî belav bûn. Ez û kesên malê tenê man. Keysa ku ez meraqa xwe jî berim, min bi dest xist. Min li firsetekê anî û gotê: “Xaltiyê! Min tu tişt ji wê dia te fam nekir, tu ji kerema xwe re dikarî ji min re bêjî ?” Xaltî fetilî ser min û got: “ Xaltî bi qurban!” Û keserek kûr kişand. “ Neviyê min hîn nû dest bi mektebê kiribû. Mualîmê/mamostê wî yê bavkafir, ji telebeyan re şorkirina bi kurdî yasax/qedex kiribû. Hinek telebeyên xwe jî wekî xefîyan kiribûn. Neviyê min jî û telebeyên wekî wî jî, bi tirkî nizanibûn. Rojekê li mal, neviyê min çaxa ku kurdî şora dike, tu nabê ku xefîkî bihîstiye û giliyê wî bi mamoste kiriye. Mamosteyê bavkafir û bavzalim, gelekî li neviyê min dixê. Neviyê min hat malê, ku ji girî ziwabûye. Me kir nekir şor nekir,te digot qey lal bûbû. Heta ku çend şorên tirkî, jiber nekirin, me dengê wî nebihîst. Heyran! Vê car ez bi tirkî qet fam nakim. Ev e panzdeh sal in kurê min şora dike, ez tu tiştî jê fam nakim. Ez ji xwe re li devê wî dinihêrim. Ger, ku bi kurdî şoran bike, min gotiye ez ê qurbanekê serjê bikim û li feqîr-fuqaran belav bikim. Xwadê şahidê min e”.

Wê şevê, ez li mala hevalê xwe yê rêwitiyê razam. Sibehê piştî taştê, min bi spasdari xatir ji wan xwest û min da ser rêya gundê xwe.

Vêga haya min jê nîn e, ka ew ciwan bi kurdî diaxife an na?

Ger bi axîfiya baş dibû. Qet nebe belengaz û rebenên wî gundî wê zîkek goşt bixwarana



Salihê Heydo

PEYVÊN PIRWATE

erebî û gelên dirawis yê dîtir. Lê ji ber ku kurdan hertim û ji neçarî zimanê biyanî xwendine û pê nivîsandine, ew di wê behweriyê de ne ku ew peyv ne kurdî ne. lê dema ku mere lêkolînê li ser dike, bi hêsanî regez û koka wan kurdî derdikeve.

Çawa tê zanînê, zimanê kurdî bi her dem û dewranê re bersivê dide û bê alozî û astengî dikare bi her tiştên zanistî, wêjeyî, xwezayî, civakî û siyasî re bigunce, lewra ew pirwate ye û gencîneya wî pir têr û tije ye, ji hêla peyvên pirwate û tiştên yekwate, pirwate û yekwate xurtbûn, şêrînbûn û dewlemendiya wî tînin holê destnîşankirinê. Çawa ku Kurdistan bi çiya, dar, av, deşt, ajal û xwezaya xwe zengîn û bi xeml û xêz e, wiha jî zimanê kurdî bi wate, derbirrîn û yeksên xwe ve pir dewlemend û dagirtî ye, û bi efsan, çîrok, mamik, zûgotinok, edyom, bend, stran, dîrok û sirûdên xwe ve pir gewz û têr e.

Lewra, ez dixwazim di vê bendê de weke nemûne, lîsteyekê ji peyvên pirwate daxînim, ku ev mînak mîna dilopekê ji deryayek bêbinî ye ku xwendevan û hezîrên ziman lê sêre bikin û ew jî hîn pirtir lêkolînê li ser van mijaran bikin. lê berî ku ez lîsteyê daxînim, dixwazim peyva pirwate şirove bikim. pirwate ew e peyva ku ji wateyekê zêdetir dide û di gel deverande bi daxwaz û angoyek dîtir tê xebitandin. Çawa ku me di mijara berê de gotinên sînonîm daxistibûn ku bi wateya gelek peyv bi yek angoyê wateyê tên.

Çendî ku zimanzan û zimannasên kurd lêkolîn û lêgerînê li ser zimanê xwe bikin, wê pirtir şêrînbûn, xurtbûn û firebûna wî bibînin. Her wekî lêkolînên pisporên biyanî û zimannasên zîrek ew ên bêlayan, bi taybetî Ensalopîdiya Firensî ravekirin û hilsengandineke wiha bi nirx daxistiye ku di nav 3600 zimanê cîhanî de zimanê kurdî ji hêla firebûn, xurtbûn û wateyên xwe de di pileya 24an de ye. Lewre di vir de em dikarin pir tiştan li ser zêde bikin û bibêjin ku ev hilsengandin di cihê xwe de hatiye.

Em dizanin ku di cîhanê de 209 dugel (dewlet) hene, çî biçûk çî mezin, û tevî ku kurd bê dugel û stato ne jî, ew ji nav 3600 zimanî di pileya bîst û çaran de hatiye. Ev tê wateyê ku zimanê kurdî ji xurtirîn zimanê cîhanê ye û kevintirîn çand e. tevî ku bi sedê salan ji hêla dijmin û neyaran ve hatiye birrîn, qedexekirin û bişaftinê. Netenê wisa jî, lê kêr û bandor li zimanên serdest û desthilatdarên Kurdistanê jî bi xurtî û fireyî kiriye. Bi sedan, bi hezaran peyvên kurdî ketine nav zimanên tirkî, farisî,

Çend mînak:

- 1-Ar: agir, ard.
- 2-Dîrok: dîroka govendê, dîroka (tarîxa) Kurdistanê.
- 3-Tîr: tîran genim, tîra kevên, meyira tîr, tîra nê.
- 4-Stran: strana hevîr, strana dengbêj.
- 5-Tî: tiyê avê, tiyê jinikê.
- 6-Tor: tora nêçîra masiyan, wêje, tor û rêzgirtina civakê.
- 7-Dîk: dîkê mirîşkan (keleşêr), dîkê paleyê ew ku hin simbil neçînê dimînin.
- 8-Zinar: zinarê çiyê, zinarê piştê.
- 9-Sipî: sipiya serî, rengê sipî, sipî sax.
- 10-Kêl: kêla gorê, kêla dirûtinê.
- 11-Dirûn: dirûna zêd (paleyî), dirûna kirê.
- 12-Kelem: lîhane, kelemê dar û beran pij.
- 13-Şana: şana hingiv, şana rû, şanê benderê.
- 14-Ber: berê darê (havl), berê kevirîn, berê kiras.
- 15-Dor: dora gund, dora te hat.
- 16-Çek: çekên lixwekirinê (kunc), çekên şer û kuştinê.
- 17-Kur: bayê kur, miya kur (bêguh), kurê filankes, xwe kur kir.
- 18-Rewan: herikandin, giyan, sivik, şêrîn.
- 19-Çeng: çenga dest, çenga bask, binçeng.
- 20-Çap: çapa dev, çapa genim, çapa pirtûkê.
- 21-Bax: bax û bistan, bax pênekir, tizbiya bax.
- 22-Kanî: kaniya avê, kaniyê şivan.
- 23-Bez: goştê bi bez, lez û bez, li bayê bezê.
- 24-Şor: xwarina şor, xizêma şor ya bêvilê, peyv.
- 25-Kun: kuna rovî (qula wî), cewdikê avê.

26-Qor: miya qor (ya lawaz û bê goşt), qorên dîwên (rêz).

27-Cot: gayê ber cot, cotê kewan.

28-Nav: nava malê, navê te çi ye?.

29-Law: kur, bedew û spehî.

30-Geşt: ger û seyran, gešta qereçiyê (para wê).

31-Perwane: minminîk, bagerînk.

32-Xwar: min xwarin xwar, ji jor hat xwar, tewandî li dijî rast.

33-Gez: qert (devlêkirin), dara gezê.

34-Zirav: bejna zirav, zirav di nava wî tune.

35-Hîz: hîzê rûn, bênamûs.

36-Beş: perçe, dûrivê pez (miya beş, golikêbeş)

37-Zengil: zengilê lêdanê, niqniqankê di nav rûn de qelandî.

38-Şîn: şîna miriyan, rengê şîn, qudret û karîn.

39-Şirik: meZRîba avê, şirika zîv, xîncera bi şirik.

40-Dol: dûnde, geliyê di nav çîyan de. ■



وعلى الرغم من تأكيدات هيئة الصحة المتكررة بعدم تسجيل أي إصابة بالفيروس في مناطقها فأن قرار الحظر، وما سبقه من قرارات تقضي بإغلاق المعابر ومنع التجمعات على اختلاف أنواعها، كان فقط للوقاية من هذا المرض أو الفيروس لكن كان لهذا الحظر تداعيات اجتماعية واقتصادية على المنطقة.

قمنا كمجلة ولات الى استقصاء وجهات نظر بعض الناس من قرار حظر التجوال و اجراءات الوقاية من كورونا المستجد التي اتخذتها الادارة الذاتية في شمال و شرق سوريا.

محمد حمو مواطن من عامودا تحدث لمجلة ولات قائلا: « قرار الحظر الذي أقرته الادارة الذاتية في ٢٠٢/٣/٢٣

العم حسين مواطن من عامودا تحدث ايضا لمجلة ولات قائلا : «بعد قرار الحظر والسماح للمحلات الغذائية والخضرة واللحوم بأن تكون مفتوحة نطالب التموين بالوقوف في وجه هؤلاء التجار الذين أصبحوا يستغلون العالم في هذا الحظر فالاسعار في ارتفاع مستمر و اغلب الناس لاتستطيع تأمين حاجاتها بسبب هذا الغلاء، كل ما أستطيع قوله أوقفوا هذا الغلاء و راقبوا الأسعار»

ابراهيم علي صاحب محل الحدادة أيضا يقول: «نحترم قرار الحظر من قبل الادارة الذاتية كخطوة منهم للحفاظ على صحتنا ونشكر جهود قوى الامن والفرق الطبية على عملهم ليلا نهارا من أجل سلامة المواطنين وكذلك نتمنى من الادارة الذاتية اتخاذ اجراءات أخرى حيال ما ينتج من تداعيات الحظر.

قبل فترة أصدرت الادارة الذاتية قرارا يسمح لنا بفتح المحلات لساعات محدودة وهي من الخامسة بعد العصر الى الساعة الواحدة ليلا لكن هذه الفترة غير كافية و لا نستطيع العمل على أكمل وجه وهذا يؤثر علينا كثيرا، نتمنى منهم مراجعة بعض قراراتهم والسماح لبعض الحرف اليدوية بفتح محلاتهم وتأمين قوت اطفالهم. ■

آراء بعض الناس من قرار الحظر الصحي في عامودا



أفسان كردي

بعد تفشي فيروس كورونا أو مايسمي ب كوفيد ١٩ في مدينة ووهان الصينية وأنتشارها في معظم دول العالم تزايدت حالات الأصابات وعدد الوفيات و وصلت الى أرقاماً ضخمة مما تسبب بحالة خوف وهلع لدى كل دول العالم.

وبسبب عدم اكتشاف لقاح ضد هذا الفيروس أقدمت معظم الدول إلى اتخاذ اجراءات وقائية كمحاولة للتصدي لهذا الفيروس و الحد من أنتشاره.

كذلك اتخذت الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا مجموعة من الإجراءات والتدابير الاحترازية بهدف مواجهة فيروس كورونا المستجد، ومنع انتشاره في مناطقها، كان آخرها قرار حظر التجوال الذي دخل حيز التنفيذ الاثنى ٢٠٢٠/٣/٢٣



DILDAR (1918 - 1948)

Niştimanperwer û xebatkarê bejinbilind, danerê sirûda netewî ya kurdî (Ey Reqîb) helbestvanê payebilind Dildar li bajarê Koye yê başûrê Kurdistanê di 20 reşemîya 1918an de ji dayik bûye.

Navê wî yê resen Yûnis Mele Reûf e, nasnava wî jî Dildar e.

Xwendina xwe ya seretayî li bajarê Ranyayê, ya navendî jî li Hewlêrê di sala 1935an de kuta kiriye.

Piştîre diçe Bexdayê û li zanîngeha wê beşê mafnasiyê dixwîne. Piştî xwendina xwe bi dûmahîk dike, Dildar wekî parêzer çend salan kar dike û dixebite.

Di karê xwe yê parêzeriyê de berevaniyê di ber doza belengaz, hejar û bindestan dike, û li dijî zulm û sitemkariyê dengê xwe bilind dike.

Di ber karê xwe re, guhdanê bi wêjeyê dike, û wêjeya rojhilatî û ya cîhanî baş dixwîne û dişopîne û ew wêje pir bala wî dikişîne.

Dest bi nivîsa helbestê dike û ji xwe re dike kar. xwe berdide deryaya wêjeyê û tê de dibe melevanekî zîrek û navdar.

Evîn û hezkirina Kurdistanê ji xwe re dike kanî û jêder û wekî bilbilekî şeyda û evîndarê welatê xwe, ji ava wê ya zelal û pak helbestên xwe dihûne.

Li kêleka mijara welatparêziyê, mijarên mirovahî û demokrasî jî di helbestên Diladar de amade û hazir bûn.

Di sala 1946an de, di dema damezirandina



komara Mehabadê de, Dildar sirûda netewî EY REQÎB nivîsî û ev sirûd dibe marşa netewî ya dewleta Mehabadê, û wekî sirûda netewî ji hemû gelê kurd re hatiye girtin û naskirin.

Dildar bi helbesta fransî bandor dibe û gelek helbestên La Fontaine û La Martine werdigerîne zimanê kurdî.

Ji bilî helbestî, Dildar çend kurteçîrokan jî dinivîse û di kovara Gelawêj de diweşîne, hin ji wan jî wek destnivîs mane.

Dema ku Dildar di lotkeya berhemdayîna xwe de bû, di encamê mirineke bêbext de di 12 tîrmeha sala 1947an de li Hewlêrê koça dawî dike. Lê ew bi berhemên xwe û bi EY REQÎB a xwe her û her dê ew di nav gelê xwe de zindî dimîne. ■



هل العالم أمام حرب عالمية ثالثة



بقلم آهين علي

من جهة والشعب من جهة أخرى كون إيران أصبحت تهدد مصالح الولايات المتحدة في المنطقة، والجدير ذكره بأن السياسي الروسي ايغور نيكولين أوضح وعبر المنابر الإعلامية أن المختبرات الأميركية السرية للأبحاث البيولوجية الموجودة في دول عدة منها جورجيا وأوكرانيا وأوزبكستان تقوم بجمع ومعالجة المواد الوراثية للسكان الروس والصينيين والاييرانيين من أجل تطوير فيروس محدد عرقياً يستهدف شعوباً معينة، وأما السيناريو الذي يتناقله نشطاء المجتمع المدني والمعنين بحقوق الانسان والذي مفاده بأن العالم وخاصة أوروبا التي تدعى بالقارة العجوز لازدياد نسبة كبار السن والعجزة والمتقاعدين والمرضى فيها وتحملها الكثير من الأعباء المادية لتوفير الضمان الصحي وغيرها من مستلزمات العيش والرعاية لذلك قامت بإطلاق هذا الوباء الذي يصيب غالباً كبار السن وذوي الامراض المزمنة وإذا صدق أصحاب هذا التكهن فنحن أمام كارثة وجريمة في حق الانسانية جمعاء، وما يثير التساؤل بأنه كثير من الفيروسات والتي سببت العديد من الامراض المعدية مثل فيروس السيدا و زيكا وانفلونزا الخنازير ومتلازمة الشرق الاوسط التنفسية الخ قد ظهرت في العقود الأخيرة وتم علاجها فما السر الكامن وراء تفشي فيروس كورونا بشكل وبائي وفي معظم دول العالم وأين العلم والعلماء من اكتشاف الدواء أو المصل المضاد لهذا الفيروس أم إننا حقاً أمام حرب بيولوجية تكمن حيثياتها في تفشي كورونا ، وما نلاحظه من التغطية الاعلامية الكبيرة التي رافقت تفشيه من قبل كافة وسائل الإعلام المرئية والمسموعة والمكتوبة رغم أن نسبة الوفيات لا تتجاوز الـ 2 الى 3 بالمئة من أعداد المصابين التي تجاوزت الآلاف وابتعاد تلك الوسائل عن ذكر أعداد المتعافين من هذا الفيروس والتي تجاوزت بكثير عدد الوفيات وهذا ما لاحظناه مؤخراً بإعلان الحكومة الصينية خلو بلاده نهائياً من فيروس كورونا وخاصة ووهان التي عدت بؤرة تفشي هذا الفيروس ، واخيراً أعود لأكرر نفس السؤال هل حقاً نحن أمام حرب بيولوجية بين أقطاب السياسة العالمية لا يمكنني القول إلا أنه الوقت كفيل بإظهار الحقائق

أو بالأحرى هل نحن أمام حرب بيولوجية تقود زمامها الدول العظمى في العالم وأولها الصين وأمريكا وهل تبادل التهم بين هاتين الدولتين حول تطوير فيروس كورونا الجديد وإطلاقه حيز الوجود لها معاني من الصحة رغم إن هاتين الدولتين طرفان في اتفاقية جنيف عام 1925 التي تمنع اللجوء إلى الأسلحة البكتريولوجية في الحروب فحسب وزارة الدفاع الأميركية فإن الصين تمتلك أسلحة بيولوجية هجومية طورته قبل انضمامها الى اتفاقية جنيف عام 1925 وبدورها تتهم الحكومة الصينية الولايات المتحدة الأميركية بأنها تقود حرب بيولوجية خفية تهدد العالم برمته وفي مقدمتها الصين كونها هزت عرش الولايات المتحدة الاقتصادي الذي تربعت عليه منذ الحرب العالمية الثانية سيناريوهات عدة تروى مع إتمام فيروس covid-19 المعروف بفيروس كورونا الجديد شهره الثالث منذ أول ظهور له في يناير المنصرم في مقاطعة ووهان الصينية ليعلن تفشيه في أغلب دول العالم ويعلن عنه من قبل منظمة الصحة العالمية كوباء عالمي، بدأت أولى السيناريوهات بربط تفشي كورونا بمختبر ووهان العسكري الذي تديره الحكومة الصينية والذي يبعد 280 متراً عن سوق ووهان للمأكولات البحرية وتسرب هذا الفيروس من المختبر بطريقة ما ، أو ربما الخلل في قواعد السلامة يكون وراء هذا التفشي مروراً بالإشاعة الأكثر انتشاراً بأن الجنود الأمريكيين ألقوا عمداً هذا الفيروس في سوق ووهان للمأكولات البحرية أثناء مشاركتهم في الألعاب العالمية العسكرية عام 2019 التي أقيمت في ووهان ، و بالمرور على السيناريو الروسي وحسب تقرير نشره موقع zvezda الروسي تحت عنوان فيروس كورونا الحرب البيولوجية الأميركية ضد روسيا والصين وإيران حيث أشارت إلى المؤامرة الأميركية الهادفة إلى اضعاف بكين تجارياً في المفاوضات المقبلة مع واشنطن، ونوه التقرير إلى استهداف الولايات المتحدة لإيران اقتصادياً وخلق هوة بين الحكومة

FERHENGOK

şanişîn	مملكة
şah	ملك
şabanî	ملكة
mîrnişîn	امارة
text	عرش
gurz	صولجان
rim	رمح
kevan	قوس
tîr	سهم
xedeng	سهم
mirtal	ترس-درع
kalan	غمد السيف
şûr	سيف
qiral	امبراطور
pasevan	حارس
Rêûresm	مراسيم
şaristan	حضارة
keleh	قلعة
koçk	قصر
peristgeh	معبد



أو أنصاف الحلول ، مدفوعة بحاجة أو ضرورة كالدفاع عن الشرف مثلاً .
- شخصية معارضة : تقف في وجه البطل ، ويجب أن تكون صلبة لا
تراجع عن مواقفها كالبطل تماماً . ويمكن أن تكون مجموعة أو مجتمعاً
أو ضمير البطل نفسه .

- شخصيات ثانوية : لتكمل الإطار العام للمسرحية .
وعلى الكاتب أن يدرك أن الشخصيات في العمل الدرامي ليسوا أناساً
واقعيين يستمدونهم من الحياة ويصورهم كما هم في الواقع ؛ بل لا بد
له أن يعتمد إلى التركيز على جوانب معينة من هذه الشخصيات تنسجم
مع موضوعه ، وتسهم في تجسيد الفكرة التي بنى عليها مسرحيته ،
كما أن عليه ألا يغالي أو يبالغ في التغيير والتعديل إلى درجة يبعد فيها
الشخصية عن الواقعية والاحتمال ..

3- المخرج : إذا كان الممثل هو ملك العمل المسرحي ، فالمخرج مالك
العمل المسرحي ، وله اليد العليا فيه ، فهو المسؤول عن تحريك عناصر
العمل المسرحي بأكمله ، وهو المسؤول الأول عن نجاحه أو فشله .

المخرج يتعامل مع النص بقراءته كاملاً ؛ لكي يتمكن من الاختيار
الصحيح للممثلين والممثلات ؛ لأداء الأدوار التي تتفق مع سماتهم الشخصية
والجسدية والصوتية ، وهذه هي أهم مسئولية للمخرج ..

4- المنتج : يساوي كلمة «التمويل» ، فالمنتج هو « قائد » العمل المسرحي
بعد المخرج ، فمن أهم وظائف الإنتاج هو تمويل العرض المسرحي
بالإنفاق على كافة متطلباته ودفع أجور العاملين . كما أن له الحق في
مراقبة الشئون المالية أثناء العرض المسرحي .

أخيراً : اشترط أهل العلم لجواز التمثيل المسرحي شروطاً عدة ، ومنها
: ألا يمثل بشخصيات لها قداساتها كشخصيات الأنبياء ، وأن يكون التمثيل
بعيداً عن المحرم ، وأن يستهدف التمثيل مصلحة الدين والإنسانية ، وأن لا
يخدم التمثيل مبدأ هداماً ، وأن يقوم على التمثيل رجال واعون لقضايا
الأمة والمجتمع . ■

خشبة المسرح بعد توافر العديد من الإمكانيات له .
ومن المقومات الهامة التي تخرج لنا الشخص
في صورة ممثل ، عوامل عديدة من أهمها :
- أول المهارات التمثيلية التي ينبغي أن تتوفر في الممثل هي
قدرة طبيعية غريزية يمنحها الله له والمتمثلة في الموهبة .
وهي مهارة غير مكتسبة وإنما هي جزء من الإنسان يولد
بها .

- وتأتي الدراسة تالية على الموهبة الطبيعية والتي تصلها
؛ حيث يزداد عمق أداء الممثل وتفهمه لأداء الشخصيات ، أو
بمعنى آخر : تحسين قدراته الإبداعية على تمثيل المختلف
من الأدوار لا يتأتى إلا عبر الدراسة الواعية المتخصصة .

وتعد الشخصية عنصراً مهماً من عناصر بناء المسرحية ،
ويتفق النقاد - باستثناء أرسطو - على أن أهمية الشخصية
توازي أهمية الحدث ، فالشخصية هي التي تصنع الحدث
وهي التي تخلق العقدة والحبكة والموضوع ، وتعرف
الشخصية الدرامية بأنها « الواحد من الناس الذين يؤدون
الأحداث الدرامية في المسرحية المكتوبة أو على المسرح في
صورة ممثلين ، كما قد تكون هناك شخصية معنوية تتحرك
مع الأحداث ولا تظهر على خشبة المسرح ، فقد يكون
هناك رمز مجسد يلعب دوراً في القصة كمنزل أو بستان » .

وفي المسرحية يجب أن يبقى عرض الشخصية في حدود
صارمة جداً ، على العكس من أنواع أدبية أخرى ، كالرواية
مثلاً ؛ وذلك لمطلوبات الحبكة والحوار والوقت المكثف
لعرض المسرحية ؛ لذلك فإن بناء الشخصية في المسرحية
يخضع لأبعاد محددة تقتضي من المؤلف الالتزام بها ،
وهذه الأبعاد هي :

أولاً : البعد المادي ، وهو الذي يتصل بتركيب جسم
الشخصية : العمر ، الطول ، المظهر العام ، وكذلك العيوب
والتشوهات الجسمية .

والبعد الثاني هو البعد الاجتماعي ، وهو ما يتعلق بالكيان
الاجتماعي المتصل بتركيب أسرة الشخصية من الناحية
الطبقية والثقافية والسلوكية ، ومكانتها ضمن المنظومة
الاجتماعية .

والبعد الثالث هو البعد النفسي ، ويتعلق بالكيان النفسي
للشخصية ، ويعتد هذا البعد ثمرة للبعدين السابقين ومتماً
لهما ؛ إذ أن أثرهما المشترك هو الذي يحيي في الشخصية
ميولها ومزاجها وهواجسها .

أنواع الشخصية في المسرحية :

- شخصية محورية رئيسية : (البطل) يتولى القيادة في
المسرحية .

ويجب أن تكون شخصية البطل عدائية لا تعرف المساومة

المسرحية .

ويجب أن تكون شخصية البطل عدائية لا تعرف المساومة



مَسْرَحٌ وَحَيَاة

علاء الدين حسن

13

المسرح شكل من أشكال التعبير عن المشاعر والأفكار والأحاسيس الإنسانية ، ووسيلته في ذلك فنُّ الكلام وفنُّ الحركة ، مع الاستعانة ببعض المؤثرات الأخرى المساعدة .

أو قل : المسرح هو البناء الذي يحتوي على الممثل ، وخشبة المسرح ، وقاعة المشاهد .. أو : المسرح هو أحد فروع فنون الأداء أو التمثيل الذي يجسّد أو يترجم قصص أو نصوص أدبية أمام المشاهدين باستخدام مزيج من الكلام .. الإيماءات .. الموسيقى .. والصوت على خشبة المسرح ذات المواصفات الخاصة في التصميم .

ويستخدم الكثير من الناس كلمة المسرحية أو العرض المسرحي مرادفاً لكلمة المسرح ، إلا أن هناك فرق كبير بين الكلمتين من حيث الدلالة ، فالأولى تشير إلى القصة أو النص الأدبي الذي يتمثل في المكان المخصّص له ؛ فالمسرحية هي القصة ، أمّا المسرح فهو المكان الذي تؤدّي فيه هذه القصة ببساطة شديدة .

أ- مقومات هامة في بناء المسرح :

1- الجمهور : المشاهدون أو المتفرّجون أهمّ عامل في إتمام العرض المسرحي ، ويطلق عليهم أيضاً « الجمهور » ، فهو الضلع الناقص الذي يكمل أيّ مثلث ناقص . وقد وصف البعض أهمية الجمهور في بناء الفنون المسرحية فقالوا : « المسرح حدث اجتماعي لا يكتمل إلا بوجود الجمهور » .

2- الممثل :

الممثل هو ملك العمل المسرحي ، وهو الأداة التي يتعرّف بها الجمهور على النصّ الأدبيّ المقدّم له والذي يقوم بتنفيذه (الممثل) على

GUNDÊ TENÛRÎYÊ

Nexweşîya ebûzirêbê û petîxên Tenûrî



Ferîd Mîtan

Ji çemê gundê Nametîyê ku li rojhilatê Qamişloyê ye heta bi Çemê Cirehê, ji qûntara Çîyayê Bagokê (Tora Banî) heta bi Çîyayê Şengalê; ji vê deşta rast û dûz ra “Sinceqa Xelef Axa” tê gotin.¹ Sinceqa Xelef Axa jê ra tê gotin, çimkî di 1802yan da ev herêma han ji hêla deşthilata osmanî ve wekî sinceq\ wîlayet hat deştnîşankirin û Xelef Axayê Xerzî bû serekê wê.² Her wiha roja îroyîn ev herêm bi navê Sinceqa Aştan jî tê naskirin û kesên ku lê dimînin ji wan ra “aşîti” tê gotin. Dibêjin ku eşîrên vê herêmê bi erebên eşîra teyan ra seraqet şer dikir, lê di demekê da peymana aşîyê bi teyan ra girê dan, loma navê niştecihan bûye “aşîti”.

Nêzîkî du kîlometreyan li rojavayê Çemê Nametîyê, bi navê Dîyarê Kêlê qelaçek heye. Li ser pişta vî qelaçî gorîstaneka berfireh ku mirîyên gundîyên derdorê lê veşartî ne, heye. Çaxa ku meriv ji jora qelaç berjêrê rexê rojava dibe, piştî 500 gavekî, bi deşt xwe ra digihêje gundê Tenûrîyê ku wargeheka kevnar a aşîtiyên Sinceqê ye. Gundê Tenûrîyê 10 kîlometreyan li rojhilatê bajarê Qamişloyê ye, 13 kîlometreyan ji bajarê Tirbepîyê û 5 kîlometreyan ji sînore bakurê Kurdistanê dûr e. Gundê Xiznayê li başûr, gundên Dekşûrî û Omerîkê li bakur, gundê Biwêrayê li rojhilat û gundên Şorik û Şewitî li rojavayê gund in. Di tenîştê gundê Tenûrîyê ra çemek dirêj dibe, havînan zuha ye û zivîştanan diherike. Cadeya Qamişlo – Dêrikê jî bi kêleka gund ve ye.

Dibîştana Tenûrîyê di 1947an da hatiye avakirin û roja îroyîn 85 mal di gund da hene.³

Çimkî tu belgeyên nivîskî der barê Tenûrîyê da peyda nebûn, me di vê nivîsarê da, xwe sipartîye birêz Hemdêyê Hecî Hisênê Qerê (1942, bawernameya sertafîkayê) ku şareza û rîsipîyê gund e.

“Mam Hemdê- şênîyekî gundê Tenûrîyê ye”

Axkolik

Di benderên gund da axkolikê (devera ku tê kolan û axa seyandin û dûtinê jê tê deranîn) hebû. Çimkî axa wê axkolikê pir guncaw û mikum bû, gundîyên herêma Sinceqê ji bo ku tenûrên xwe lê bikin, dihatin axa xwe ji wir dikişandin û pê tenûrên xwe lê dikirin û diseyandin. Ji ber vê yekê navê gund di herêmê da bû Tenûrîyê.



Eşîrên Tenûrîyê

Di herêma da naskirî ye ku ev gundê han ê eşîra kuresan (an jî kureseyan) e. Lê wekî din, eşîrên: hermêsî, elîkî, omerî, zibêda, dilmemikî, çomera û dorika lê hene û berî niha tinatî jî lê hebûn. Gundîyên Tenûrîyê bi piranî ji eşîra kuresan e, wan her û her mezinahî lê kiriye û bi deştê wan ava bûye. Kuresan di nav xwe da dibin çend bavik û binemalên sereke; her wekî: Mala Qerê, Mala Enber, Mala Hebçî, Mala Began, Mala Tehlo, Mala Xelef Helê, Mala Herşa û Xemê û Îskên. Gundîyên Tenûrîyê yên eşîra kuresan dibêjin ku ew bi eslê xwe ji gundê Difnê ne. Difnê di

¹ Konê Reş, Dîroka Qamişloyê, Weşanxane-ya El-Zeman 2012.

² Ehmed Sadûn, Sinceqa Xelef Axayê Xerzî, Kovara Sormeyê, h 22, 2018.

³ Hejmara malên gundîyan ji M. Evdilhekîm Mihemed ku niştecihekî Tenûrîyê ye, hatiye wergirtin.



navbera Çîyayê Mava û yê Reman da ye û roja îroyîn girêdayî navçeya Heskîfê û parêzgeha Batmanê ya bakurê Kurdistanê ye. Rîsipîyên gund heta bi bavikê xwe yê heştan jî dihejmêrin û wisa didin zanîn ku hemî li vî erdî hatine dunyayê û koçkirina wan a ji gundê Difnê vedigere sedên salan.

Nexweşîya “ebûzirêb”ê û jinûveavakirina gund

Di navbera gundîyên Tenûrîyê û eşîrên derdorê da her û her, mîna hemî êlên kurdan, şer û dubendî li dar bûn. Lewma, gundîyan zêdetir ji carekê gund berdaye û paşê vegerîyane û ji nû ve lê danîne. Lê di destpêka sedsala 20an da afateka nedîtî bi ser gund da tê û navê xwe di bîrdanka Sinceqa Xelef Axa da mayînde dihêle. Dibêjin ku ev afata han “nexweşîya ebûzirêbê” bû ku di 1914an da bi gundîyan ket. Nîvê gundîyan pê ket û nîvê mayî gund berda û belavî derdorê bû. Herçî pê diket, bi qasî sê rojan tayê ew digirt û paşê rih disipart. Heta roja îroyîn jî heke kesek bixwaze nîfîrekê li yekî bike, jê ra dibêje, wey tu bi ebûzirêba Tenûrîyê bikevî. “Ebûzirêb” navê nexweşîyeka sewalan e, lê çiku wê hingê li deverê hekîm û nexweşxane tune bûn, kesekî navê wê êşê nedizani û ji wan wetrê ku heman nexweşî ye. Di raştîya xwe da ev nexweşîya han “kula reş” an jî “webaya reş” (plague\طاعون) bi xwe bû.

Pişti ku gundîyan gund berda bi salekê duyan, an ku di 1915 - 1916an da, gundîyekî berê yê bi navê Birhîmê Hecî Ûsiv û birayê wî Simê vegerîyan û gundê Tenûrîyê ji nû ve ava kirin. Paşê di 1923yan da, Hesenê Birhîm (mezinê kuresan) ku li Wêranşehrê li nik binemala Birahîm Paşayê Milî bû, vegerîya gund û mezinahî lê kir, ango bû axayê gund. Ji wê hingê ve û heta roja îroyîn, ev gund şên û ava ye.

Mexmûrîyên ereb

Gundê Tenûrîyê li ser “xeta dehan” e û axa wê ji milê çandinîyê ve pir bi ber û bereket e. Aqarê gund ku di dest mala axê da bû, 1260 çewal bû. Lê di proseya erebkirina herêmên rojavayê Kurdistanê da, desthilata Şamê bi serkêşîya Partîya Baesê di 1975an da erebên Reqayê yên bi navê “mexmûrîyan” naskirî ne anîn û li Cizîra rojavayê Kurdistanê, li gundên nêzîkî sînor bi cih kirin û zevîyên kurdan li wan belav kirin. Ji 1260 çewal erdê Tenûrîyê, rêjîmê tenê 180 çewal erd da binemala axê û nêzîka 1100 çewal erd li erebên mexmûrî belav kirin. Li kêleka Tenûrîya kevînar, bi navê Tenûrîya Mexmûrîyan gundek ji erebên Reqayê ra hatiye avakirin. Tixûbê kurd û ereban Çemê Tenûrîyê ye. Ereben mexmûrî heta vî keliyê jî bi hêminî di gund da dijîn û zevîyên kurdan diçînin û diçînin.

Petîxên Tenûrî

Navê “ebûzirêb”ê û “petîxên Tenûrî”, ji navê gund ra bûne wekî cotnavekî û ev gundê han herî zêde bi van her du serenavan naskirî ye. Îroj, hem li deverên wekî Şam û Libnanê hem jî li Tora bakurê Kurdistanê, petîxfiroşên deverê ji bo ku zûzûka malê xwe bifiroşin, bang dikin, “werin petîxên Tenûrî!”. Dibêjin ku berî salên 1940an, gundîyekî cenana bi navê Siloyê Mehmûd ê dorikî hebû. Silo ji Tenûrîyê diçû gundê Kertwênê yê serxetê û li wê derê cenani û avdanîya birincê dikir. Di zevîyên Kertwênê da raştî hin pinên petîxan ku li ber co û mişarên avê jixweber şîn hatine tê. Çendekan jê dike û bi xwe ra tîne Tenûrîyê. Piştî ku dixwe, tê derdixe ku tameka miz a hew jê xweştir tê da ye û vî yekê bi gundîyan dide zanîn. Paşê gundî tovê wan petîxan diçînin û petîxên xwe li bazara Qamişloyê difiroşin. Bi vî awayî nav û dengê “petîxên Tenûrî” li derdorê belav dibe. ■





Amadekar: Nêçîrvan Rojava

Ji destpêka pêvajoya perwerdeyê ya li rojavayê Kurdistanê ve û ji ber rewşên cuda cuda, gelek caran perwede rawestîyaye. Hin caran ji ber teqînan û hin caran ji ber şerê ku ji hawirdor ve li dij deverê bi giştî pêk dihat. Her car jî Desteya Perwerde û Fêrkirinê, li gor dem û taybetîya rewşê, çareyek ji qutbûna perwerdeyê ra didît. Vê carê sedem ne tenê girêdayî rewşa Rojavayê ye, lê têkildarî rewşa cîhanê tevî ye. Çimkî weke di hê zanîn vîrûs û êşa Coronayê bajar û gundek li ser rûyê erdê nehiştiye ku xwe lê nekiriye mêvan, jîyana mirovan talan kiriye û paşroja mirovahîyê wêran kiriye.

Rêveberîya Xweser li bakur û rojhilatê Sûriyeyê ji bo parastina gîyanên welatîyên deverê, ji 23.3.2020 ve rewşa qedexeya çûn û hatinê li rêveberîyên xweser û sîvîl ragihandiye. Berî wê jî Desteya Perwerde û Fêrkirinê ji 14.3.2020 ve dibistan, zanîngeh, peymangeh û akademî girtine; ji ber cihê ku herî mirov lê kom dibin ew der in. Lewra proseya perwerdeyê nîvco ma.

Dibistana Malê, çareya lezgîn

Ji bo ku 230 hezar xwendekar¹ ji xwendin û perwerdeyê bêpar nemînin, Desteyê demlîdest dest bi projeya fêrbûna ji dûr ve ya bi navê “Dibistana Malê” kir. Di vê projeyê da mamosta waneyan li pêş kamîrayê didin, wane di hên tomarkin û li ser televizyon û internetê di hên weşandin.

Destpêkê waneyên qonaxa navîn û amadehî; paşê yê qonaxa seretayî dê bi hên dayîn. Ji cihê ku perwerde lê rawestîyaye mamosta dê berdewam bikin. Jixwe wane bi her du zimanan, zimanê kurdî û zimanê erebî di hên dayîn. Li akademîya ş. Egîd Cîlo ya li Qamişlo ji bo xwendekarên kurd, mamosta waneyan didin û tomar dikin û li akademîya ş. Egîd Cîlo ya li Hesekê ji bo xwendekarên ereb, wane di hên tomarkin. Ji ber peydabûna alavên fêrkirinê, her du akademî hatine dîyarkirin.

Rojava TVyê barê weşandina waneyan girtiye li ser milên xwe

Ji ber ku her xwendekar nikare bi rêya internetê waneyan bişopîne, kenala Rojava, şeş demjimêr ji bo weşana dersan veqetandine. Ji 8:00ê sibehê heta 12:00 herweha ji 14:00 – 15:00 û 16:00 – 17:00. Heke ji ber qutbûna keherebeyê xwendekar negihîje li waneyan temaş bike, derengî şevê wane ji 20:00 heta 00:00 di hên dubarekirin. Herweha her waneyek derdora 20 xulekî dirêj dike.

Li gor m. “Evdilqadir Reşko”, mamostayê biranşa Zimanê Kurdî, yek ji wan mamostayan e ku di projeya “Dibistana Malê” da başdar e û pirtûka Rêzimanê ya refa 11an dide, li gor wî berî Coronayê mamostayan hema hema sê behrên pirtûka Rêzmanê qedandibûn

ku wî perwerde ji beşa 5an ve dest pê kir û pirtûk bi xwe 6 beş in. Dêmek tenê du beşên pirtûkê mabûn ku jixwe dan û tomarkinê wan jî bi dawî bûye. Reşko bang li malbatên xwendekaran kir û got: “Tiştê em ji malbatan dixwazin, perwerdeya zarokên xwe bişopînin û waneyan li ser bernameya Youtube² ji wan ra derêxin; ji ber ku gelek caran elektrîk li deverê nîne, loma xwendekar dê nikaribin hemû dersan li ser Rojava TVyê bibînin”.

Ne tenê wî jî lê belê her mamosta dê bi xwendekarên xwe ra waneyan bişopîne û hewl bide bi rêya internetê bersiva pirsên wan bide û xalên nezêl ji wan ra bêtir rave bike. Herweha ev proje derfetê li pêş xwendekar vedike ku ji carekê zêdetir waneyê ji xwe ra dubare bike; ji bo ku baş li ber bikive. Pergala nirxandinê jî dê li gor rewşê dîyar bibe, lê egera herî xurt ew e ku mamosta encama werzê yekem ji bo nirxnadina xwendekar bingehe bigire.

Hêjayî bibîrxistinê ku perwerdeya bi zimanê dayikê ji 9.5.2012 ve bi awayekî fermî li dibistanên rojavayê Kurdistanê bi rê ve diçe. Ji gava pêşîn û heta vê gavê jî tûşî gelek kelem û astengîyan hatiye û di hê, lê her û her ji bo her arîşeyê, bi rê û awayên têvil mamostayan çareyek dîtiye û xwe li her deverê gihandine şagird û xwendekarên xwe. ■

2 Linka kenala «Dibistana Malê» li ser Youtube

<https://www.youtube.com/channel/UCijsGzGn84PT7GeZ4blKU2A>

1 Rohat Xelil Hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Cizîrê
<https://youtu.be/z10Xv8DV1IE>



DU HELBESTÊN WALLACE STEVENS



Wergêr: Şêrko Dakorî

Peter Quince li ber Klavîrê¹

I

Çawa tiliyên min li ser van kilîtan
 Mûzîkê dijenin, wiha eynî dengen
 Li ser canê min jî mûzîkê dijenin.

Mûzîk hest e, naxwe, ne deng e;
 Û wiha ew tiştê ez pê dihisim,
 Li vê oda han, gava dilê min dibije te,

Û bi hevirmêşa te ya sî-şîn diramim,
 Mûzîk e. Ew dişibihe wê tengijîna
 Ku Sûzana di her du kalan de şiyar kir²:

Di êvareke kesk, zela û germ de,
 Li gulistana xwe ya aram serê xwe şîşt, dema
 kalên çavsor lê temaşe dikir û dihisyan

Çawa têlên hebûna wan ên stûr dilerizîn
 Bi hevawazine nayab, û xwîna wan a ruhî
 Li ser têlan limêja Hosanna lê didan.

II

Di ava kesk, zela û germ de,
 Sûzana pal dabû.
 Geriya

¹ Klavîr: Amûreke mûzîkî ku jenyar li kilîtên wê dixwe, wek piano û harpsîkordê.

² Çîroka vê helbestê ji Tewratê ye. Sûzana jineke xweşik bû ku du kalan ew dîtibûn gava serê xwe dişîst û gef dabûnê ku heger zînê bi wan re neke wê li dadgehê lê bibin şahid û gumanbariya zînê têxin stuyê wê de. Sûzana daxwaza wan nepejirand û li dagehê qadiyekî jîr derewên herdu kalan derxistin û ew îdam kirin.

Li hingavtina kaniyan,
 Ê aşopine veşartî
 Dîtin li ber çavan.
 Keserek da
 Ji ber evqas leylan.

Li ber avê rawestiya
 Di hênikayiya
 Hestên mezaxtî de.
 Di nav pelên daran de hisiya
 Bi xunava
 laveyên kevnare.

Li ser gîhê meşiya,
 Hîn dilerizî.
 Ba wek xizmetkarên wê bû,
 Li ser nigine şermîn,
 milpêçên wê yên rêsayî anîn,
 Di gel hinek dudilî.

Henaseyekê li ser destê wê
 Şev lal kir.
 Zîvirî
 Çingekê lêxist,
 Di nav borîzanên ku dikirin hirjîn.

III

Zû, bi pêjnekê wek dengê defan,
 Navmaliyên wê yên bîzentî hatin wê
 dera han.

Mat man li Sûzana û giriyê wê,
 Ji ber kalên rawestî li kêlekê;

Ê gava bû pistpista wan, lazîme
 Wek dareke biyê bû ku baran bide ber xwe.

Di cih de pêtên bilind ên çirayên wan
 Sûzana û şerma wê dan ber çavan.

Dû re, bîzentiyên ku bédil dibişirîn, reviyên,
 Bi pêjnekê wek dengê defan.

IV

Spehîtiya di hiş de demikî ye—
 Şopandineke girjbûnî ya dergehekî ye;
 Lê di laş de nemir e.

Laş dimire; spehîtiya laş dijî,
 Wiha êvar di çûna xwe ya kesk de dimrin
 Mîna pêlekê, ku bédawî diherike.
 Wiha gulistan dimirin, henaseyek bêhn-nerm ji wan tê,
 Kulavê zivistanî, tamam dike tobê.
 Wiha keç dimirin, bi şahiyekê
 hingûrî ya korala keçekê.

Mûzîka Sûzana têlên bêşermiye
 Ên wan kalên sipî hingavt, lê, bi reva xwe,
 Tenê zîqîniya tenaz a mirinê hişt li dû xwe.

Anha, di nemiriya xwe de,
 li kemaçeya zelal a bîrhatina xwe dijene,
 Ê pesndanê dike qurbaneke berdewam. ■

Sêzde şêweyên nerîna li şalûr

I

Di nav bîst çiyayên berfîn de
Tiştê tenê yê dilivîya
çavê şalûr bû.

II

Ez bi sê rayan bûm
Wek darekê
Ku sê şalûr li ser bin.

III

Şalûr di bayê payizî de dizîzikî.
Beşek biçûk bû ji şanoya bêdeng.

IV

Mêrek û jinek
Yek in.
Mêrek û jinek
û şalûrek
Yek in.

V

Ez nizamî kîjanê hevîz bikim,
Bedewiya çivandinên zimanî
Yan bedewiya paşbêjiyan,
Şalûr gava difikîne
Yan kêlîka yekser piştî wê.

VI

Zembelîkan pencereya dirêj
Tije cameke hovane kiribûn.
Siya şalûr
Di ber re diçû û dihat.
Raweyê
Di siyê de sedemek şopand
Ku şîfra wê nayê vekirin.

VII

Hey mîrên weza li bajarê
Haddam,
Çima hûn firokên zêrîn tînin
xeyala xwe?
Ma hûn nabînin çawa şalûr
Li dora nigên
Jinên li ber we dimeşe?

VIII

Ez zaravîne sergewer
dizanim
Û kêşîne diyar ku ji wan nayê
revîn;
Lê ez dizanim jî
Ku şalûr têtetî ye
Di wî tiştê ku ez dizanim de.

IX

Gava şalûr firiya û ji ber
çavan çû
Fîrîna wî hawîrdora
cergeyekê
Ji gellek cergeyan nîşan da.

X

Bi dîtina şalûrên
Ku di şewqeke kesk de
difirin,
Heta patroneyên xwedî
dengên hevsaz
Wê bi dengê tûj bikirana
qîrîn.

XI

Di *Connecticut* re geşt dikir
Di rahênereke cam de.
Carekê, sawek kete nava wî,
Tê de li ber çavên wî
Siya amêra wî
Bû refek şalûr.

XII

Çem diherike.
Tekez şalûr difire.

XIII

Êvar bû paş nîvro gişî.
Berf dihat
û wê hîn bihata.
Şalûr rûniştî bû
Li nav şaxên dara kajê. ■

من أجواء الحظر الصحي في عامودا



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



العدد (٧٢) ٢٠٢٠/٣/١ م